K'EREMÊ ANQOSÎ

# QEWLÊ HEQÎQETÊ



“HOLE, HOLE,HOLA SULT’AN
ÊZÎDÊ SORE!

K’EREMÊ ANQOSÎ

# QEWLÊ HEQÎQETÊ

Dastana derheqa pirsgirikêd rewşa dîn-bawariya Êzdiyêd welatêd Sovêta berê da

Neşra 2.

T’İBÎLÎSÎ – GURCİSTAN
2013

**Kontakt: E-mail:**
**karameankosi@mail.ru.**
**Mob. (995) 599 41 71 97.**
**Skype: kara-kosi.**
**Home: (995 32) 218 77 75.**

**KARAM ANKOSI**
**A WORD OF TRUTH**
(In Kurdish)

**This poem written in verses tells us about those actual religion - social processes which nowadays take place in the life of yezids ( the followers of the Yezid religion ) of the former Soviet Union.**

**For the first time this poem was published in 1999 in the literary collection of Karame Anqosi “The past, the present and the future of Yezidism “ (in kurmanji language)**

**КАРАМ АНКОСИ**
**СЛОВО ОБ ИСТИНЕ**
**(на курдском языке)**

**В поэме в стихотворной форме говорится о тех актуальных религиозно – общественных процессах, которые происходят в наши дни в жизни езидов (последователей Езидской религии) бывшего Советского Союза.**

**Впервые поэма была напечатана в 1999 году в литературном сборнике Караме Анкоси «Езидство в прошлом, в настоящем, в будущем» (на курдском языке).**

# QEWLÊ HEQÎQETÊ

"Bedîl dihatin û diçûne,
Kêm bûn alim û xetxûne,
Lema jî yek û du berî nasbûne".

"Ew bedîlê der k'evin,
Ew bedîlê li hev k'evin,
Ew bedîlê Mêra bikine şike".
(Ji "Qewlê Îmanê")

**1. Eva Qewlê dewr - zemanê meye,**
**Heq - neheqiya êzdiya tê da heye,**
**Xwe davêjine ser p'işka şile'tê,**
**sê h'erfê me t'ev hileye.**

✺

**2. Eva Qewla Qewlê H'eqîqetê,**
**Baş guhdar kin gotinê vê xetê,**
**Xwedê k'iriyamet dayê êzdî lê**
**bikin h'izretê.**

✺

**3. K’ê vî Qewlî r’a bibe yare,**
**Nevsa wî ber Xwedê t’ucar nabe xare,**
**Te’lî-tengiyê dîn wê bibîne, hilde ser xwe toq û bare.**

✺

**4. Mix’arek hebû ciyê e’babetê,**
**Kanîk jê dik’işiya bi qewata qudretê,**
**Êzdiya xwe mor dikirin ew bû ava cinetê.**

✺

**5. Şêx Adî cindiyê xwe k’om kirin,**
**Qesta Mix’arê, Kaniya Sipî kirin,**
**Destûrî Xwedê, Mêr-Meleka xwe ziyaret kirin.**

✺

**6. Laliş kirine warê Mîra,**
**Li wê danîn Dîwana Feqîra,**
**K'oç'ekê ber kuç'ikê nûrîn kirine xizmeta p'îra.**

✺

**7. Gotin: "Riya Mêrê Dîwanê heq û rastin!"**
**Ra bûn ol û erk'anê kemn guhastin,**
**Êzdiya r'a xêr û berek'eta Xwedê xwestin.**

✺

**8. Şêx Adî h'ed û sed danî,**
**Ferzê biratiyê li hev anî,**
**Sê h'erf sêvirand, êzdî pê wan kirine bawar û reh'manî.**

✺

**9. Şêx Adt, şêx Îsn mêrne çê bûn,**
**Ji wan k'itêb-deft'er çê bun,**
**Qelem ji Ferxê Adiya girtin, xweş**
**jê t'êr bûn.**

✺

**10. Nivîsîn k'itêb û deft'ere,**
**R'adibûne ser membere,**
**Zimanê e'rebî, gotinê Quranê**
**êzdiya r'a kirin şertê herî here.**

✺

**11. Şêx Adî dînê Êzdan teng kir,**
**Mêr dora xwe civand reııg bi reng**
**kir, Bû p'êxember, êzdiya r'a bi**
**navê Xwedê deng kir.**

✺

**12. Şêx Adî ulm li Şamê hilgirî,**
**Dewrana dewran birî, Ne got,**
**rojekê zanîn pêş k'eve, aqilê**
**êzdiya ferzên wî danî nabirî.**

✺

**13. Îro kes nemaye bik'işîne we**
**minetê,**
**Êzdîno, werin bixûnin vê xetê,**
**H'erfê wî nesîh'etin, rojekê kêrî**
**we tê.**

✺

**14. Zemanê berê va bû,**
**Qelem êzdiya r'a gune bu,**
**Her çi şêx-p'îrên nexwendî**
**digotin, her ew bû.**

✺

**15. Îro êzdiyan qelem hildane deste,**
**Ulmê dinê r'a kirine qeste,**
**Qedex'a xwendinê bi ç'e'va dîtin**
**bi qeste.**

✺

**16. Îro ew bedîl der k'etin,**
**T'erîq û mirîd li hev k'etin,**
**Şik birine Mêra, Mala Adiya r'a**
**de'v k'etin.**

✺

**17. K'etine de'v Mala Adiya,**
**K'itêb dêrxistin xwendiya,**
**Dane ber ç'e'va heq-neheqiya**
**pisên Adiya.**

✺

**18. Zemanê me ne t’u xêre,**
**Şêx û p’îr revînê ji lêre,**
**Êzdiya xwe vekirin dergê mizgevt**
**û dêre.**

✺

**19. Derk’etiye dewreke ser dewrêye,**
**Dînê êzdîtiyê dih’ele li vêye,**
**Bira bawariya xwe nayîne li**
**birêye.**

✺

**20. Êzdî k’înê hev r’a dik’işînin,**
**Ç’e’vnebar, zinêk’ar, delingşînin,**
**Lema jî mane bê heq, bê welat û**
**şaneşînin.**

✺

**21. Bira xêra birê qet naxweze,**
**Ji hev direvin xal, ap û biraze,**
**Êzdî h'etanî ser wî aqlî bin,**
**nagîjine t'u miraze.**

✺

**22. Hilşiya h'ed û sede,**
**Qirara r'a heye we'de,**
**Doza Mala Adiya ji êzdiya digire**
**kem merde.**

✺

**23. Îro nefsa geiek êzdiya xare, ne**
**I i Jore,**
**Davêjine ser dînê xwe qisêd p'ir**
**qore.**
**Dil nakin herne h'izreta Sult'an**
**Êzîdê Sore.**

✺

**24. Xerqe, K'ulik wê rizîne,**
**Havêtine ser mêzîne,**
**Şêx, p'îr, mirîd hev r'a bûne**
**xal-xarzîne.**

✺

**25. Dilê êzdiya biye bazar-sûke,**
**Şêx, p'îr, mirîd direqisin**
**bindarûke,**
**Şile'tê r'a dizevicin, wana r'a**
**dibin zava, bûke.**

✺

**26. Cahêl nizanin çi îmanîne,**
**Ola şêx Adî, Mêra r'a bê derdîne,**
**Ji şêx û p'îra kêm mane**
**şikestiyêd dîne.**

✺

**27. Êdî e'babetî nakin Xerqeye,**
**Nizanin ew libsê Xwedê bi xweye,**
**Naçine ber damana şêx û p'îrê xweye.**

✺

**28. Mirîdan, şêxan, p'îran,**
**Ji zû va berdane fenê mîran,**
**Ne jî êdî e'babet dikin wan feqîran.**

✺

**29. Tawûsî êdî ne siyare,**
**Xaç' xwe r'a kirine yare,**
**Laliş, Şengal, Ç'iyayê Mişetê r'a dibêjin ne t'u ware.**

✺

**30. Sunet êdî ne yê wanin,**
**Ne rezin, ne jî rezvanin,**
**Sunet berdan, êzdî ne h’evcê wan ferzanin.**

✺

**31. Îro ji şêx, p’îran ulmdar neman.**
**Kes nak’işîne derdê van deman,**
**Qewlbêj derk’etine zaneyê çendik sebeqan.**

✺

**32. Kêm dikin xizmetê vî dîne,**
**Waxt bê şêxtî, p’îrtî qet namîne,**
**Herçî şêx Adî, şêx H’esen ava kirin, wê k’okê da hilşîne.**

✺

**33. Şêx, p'îran xêr xwe r'a dibirin,**
**K'ivş bibûn, nasebirin,**
**Xof, r'ema Êzîdê Sor, Melek**
**Tawûs kêm dikirin.**

✵

**34. Di'a, dirozgêd wan e'babetê,**
**Kes nema xaş mak ke şe'detê,**
**Ulmê şêx Adî û Mêra wê tê ber**
**t'emamêtê.**

✵

**35. Hîviya t'eriqan ne t'u ji hîviyane,**
**Mirîd dest ber didin ji Mala**
**Adiyane,**
**Qedrê wan ber zêndiya k'et,**
**dibine şêx, p'îrê miriyane.**

✵

**36. Hê şêx Zeyîdîn, şêx Al neyî sipar bûn,**
**Her pênc t'erîqe xwe r'a de'vîdar bûn,**
**Ferzê biratîyê û merebtiyê r'a ne bawar bûn.**

✺

**37. Wê diçe dewra şêxan û p'îrane,**
**Êzdî êdî naçine ber malêd girane,**
**Qet nak'işînin minetê ji govek û e'slê t'erîqêd Mala Adiyane.**

✺

**38. Xelqê k'itabê îro jî sere,**
**Borîna wan tê li dinê her dere,**
**Vî zemanî da jî êzdî mane bê nivîs û deft'ere.**

✺

**39. Eva gunehê şêxan û p’îran,**
**Dîwana xasan û feqîran,**
**Reşbelekek çê nekirin boyî**
**e’babetê dergê Mîra.**

✺

**40. Ew xêra êzdî îro didin boyî saxane,**
**Ne Xwedê r’a û r’ih’ê wan**
**miriyane,**
**Van cûra naz – nemeta Êzîdê Sor**
**qebûl nake t’u waxt, t’u zemane.**

✺

**41. Xêra miriya lazime bi goşt û de’n**
**bî,**
**Şêx û p’îr lazime qenc bî,**
**K’êrê bidî situyê dewara xêrê her**
**sunet bî.**

✺

**42. Ger ne sunet kirî,**
**Xêra miriya h'eram kirî,**
**Xwedê vê gunê nabexşîne, bê îman kirî.**

✺

**43. Hûn bizanbin ehlêd mirinê,**
**E'zîzê min qirarek kire axreta dinê,**
**H'etanî ciniyaz li male t'u nan naê danînê.**

✺

**44. Mala mirî bê nan bibî,**
**Hewarî bi qonaxê cînaran dibî,**
**Gunekî girane rex qalibê mirî nanxur dibî.**

✺

**45. Ew k’asê şerabê hûn vedixwin,**
**ne yê Êzîdê Sore,**
**Ne jî dak’etiye ji E’rşê Jore,**
**Ne jî şêx Adî û Mêran danîne ser**
**More.**

✺

**46. H’alê me êzdiyan îró h’alê denûne,**
**K’ubariyê qirarêd dîn dikin k’af û**
**kûne,**
**Em çi îro unda dikin, êdî venagere**
**ji ç’e’van birêjin hêstir û xûne.**

✺

**47. Şevekê li xevnê E’zîzêm bû dîhare,**
**Dengek ji e’zman ser min da hate**
**xare,**
**Go: “Evî toqî hilgire, xelqê min**
**vegerîn ser riya heq baware!”**

**48. E’zîzê min got:”Rabe, here,**
**Çarnikalê diniyayê seranser bigere,**
**K’oç’ekan rake, qirarêd min bila bigîhînine êzdiyên h’emû dere!**

✺

**49. Bêjin: “Ez Xaliqê wanim,**
**Bê şirîk û bê hewalim,**
**Herç’î êzdiyêd xizmeta min bike, ber dilê wanim!”**

✺

**50. Şev û rojan ez vê fikarê bûm,**
**Dayîna Xwedê nuxtê wê surê bûm,**
**H’etanî qedem guhast xizmeta ber dergê wê Durê bûm.**

✺

**51. Qewlê min bibihên gelî guhdêra**
**Wê ji me derên Xwedanê xêra,**
**Ser At'qata Êzîdê Sor wê vegerînin**
**Cindiya û Mêra.**

✺

**52. Werin hûn xweyî nedera,**
**Banga Êzîd bînin her dera,**
**Tav û Sîn Xwedanê zorin, nedine t'u**
**dîndera.**

✺

**53. Dînê me dînekî Heq û Raste,**
**Kuç'ikêd xwe t'u dema nedida**
**guhaste,**
**Mayîna me t'enê ser p'işika**
**êzdîtiyê dixwaste.**

✺

**54. Wê derk'evin K'oç'ekêd**
**Heqîqetê,**
**T'emîziya Dîn bikine misilh'etê,**
**P'êxemberek wê rabe bona rastiya**
**Dinê û Axretê.**

✺

**55. Wê k'ivş bin xwedannedere,**
**Paqîjiya dîn wê derînin li dere,**
**Êzîd, Tawûs, Tav, Hîvê û Sitêrka**
**Sibê pîroz kin her dere.**

✺

**56. Wê rojek bê bibe gaziye,**
**Êzdî wê xwe dûr xin ji şêx – p'îrêd**
**xal-xarziye,**
**Ber Bînaya Ç'e'va wê diyar bin**
**K'oç'ekêd êzdîxane jê raziye.**

✺

**57. Roj bê êzdî wê ji gotinêd e'rebî k'ûvî bî,**
**Dîwana Dînî bê H'ed û Sedî bî,**
**Ciyê her pênc t'erîqan yek K'oç'ekê şikestî bî.**

✺

**58. Xiyalê dilê min Êzîdê Sore,**
**Tawûsî Melekê e'rşê Jore,**
**Tav, Sitêra Sibê û Hîva dinê ser more.**

✺

**59. Sê nave, yek Beşere,**
**Navê Şems, Tawûs, Êzîd sere,**
**Ew Xwedayê h'emû êzdiyayî herî here.**

✺

**60. Sura dînê Êzîdê Sor hildin h'esêva,**
**Mak kin qewla, binîvîsin k'itêva,**
**Ji wan h'erfan hûnê bibînin xoşî,**
**şayî û e'cêva.**

✺

**61. Eva Qewla p'ayê Tav û Sîne,**
**Ne ji k'itavêd Încîl, T'ewrat û**
**Quran – Yasîne,**
**Xwedê ew k'iriyamet dayê, xet û**
**rêzêd K'eremê Anqosîne.**

✺



“TAWÛSA”
Lİ T’İBÎLÎSÊ